

Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkîyê“

III.3.B. Koalîsyonên Jinan ên li Qadên Lêkolînê

Charlotte Binder

Îlon 2017



III.3.B. Koalîsyonên Jinan ên li Qadên Lêkolîne

Di derbarê têgehên ‚koalîsyon‘ û ‚polîtîkayên koalîsyonê‘ û herweha pratîkên koalîsyonê de lêkolînên azmûnî yên bi zimanê Almanî pir kêr in (Leidinger 2011: 283-284). Leidinger di gotara xwe de pênaseyên derbarê têgeha yên Raschke (1985), Levi û Murphy (2006) herweha ya Hildebrandt (2007) xulase dike û bi taybetî „berdewamkirina koalîsyonan“ dest nîşan dike (Leidinger 2011: 287). Dema Raschke koalîsyonan wek „hevgerêdana bi koordîne ya hêzên siyasî yên serbixwe û hevpar“ (Raschke ji Leidinger hat girtin 2011: 285) pênase dike, Levi û Murphy „hevkarî, cudahî, nehênî, parkirin/girêdayîbûna çavkaniyê, xwemalîbûn û guhertin herweha [...] çareserkirina nakokiyên“ û berjewendiyên hevpar wek krîterên bingehîn ji bo avakirina ‚amadekariyên hevkar“ dest nîşan dikin (Leidinger 2011: 286).

Acar û Altunok, ku xwe ji bo qada lêkolînê ya Tirkiyê bi têgeha hevbirîne (intersectionality) ya ji hêla Kimberlé Crenshaw ve hatiye pêş xistin, girê didin; dibêjin:

Hevbirîna tevgerên civakî dikarin bi awayên cuda ji dijminatî heta hevaltîyê pêk bên. Dema ji bo şîrîkî û koalîsyon wekheviya birdozî û hevbirîna berjewendiyên hevpar wek pîvang neyên dîtîn jî, ji bo bigihîjin armancên xwe yên siyasî serkeftîbûn [ji bo wan] pêwîst tê dîtîn. (Acar und Altunok: 2009)

Wek encama nirxandina literatura derbarê mijarê de, – wek mînak nivîsa doktorayê ya Charlotte Binder a di derbarê polîtîkayên koalîsyonê yên di derbarê roja jinan a navnetewî yên li Berlîn û Stenbolê (2016) ji bo pênaseya platformên li qadên heremê – pîvanên li jêr hatin tespît kirin:¹:

- Plansaziya hevpar a çalakiyan
- Formule kirina berjewendiyên hevpar
- Hevgerîndina aktor*ên ku politikayên nasnameyî girêdayî kategoriyên cuda yên

¹Avasaziyên wek ‚meclîsa jinan‘ (*kadın meclisi*), Meclîsa Jinên Sosyalîst‘ an jî ‚Înîsîyatîfa Jinan‘ (*kadın girişimi*), Înîsîyatîfa Jinan a ji bo Aşitîyê‘ di çarçoveya van krîteran de nikarin wek koalîsyon bên pênase kirin.

heterojen û oryantasyona bîrdozî dişopînin

- Xweseriya hevkar*ên koalîsyonê
- Xwepênasekirin an jî têgihîştina pêkhatiyên ji bo „koalîsyonê“

Li ser vê esasê li çar heremên qadê 12 koalîsyonên² jinan hatin tespît kirin. Ev koalîsyon li gorî daneyên azmûnî ku li qadên lêkolînê girêdayî taybetî, avabûn, binyata rêxistinê û amûrên ragihandinê, mijar û çalakî, têgihîştin û armanc herweha mayîndetiya koalîsyonê tînan karakterîze kirin û di dawîya de tînan berhev dan.³ Ligel vê wateya kategoriya analîzê – herêm – ji bo mijara koalîsyona jinan ji nêz ve tê dest nîşan kirin.

1.1 Koalîsyonên Jinan ên li Enqerê

Ji bo herema lêkolînê Enqerê, ku li wir bi 20 pispor*an re di sala 2014’an hevpeyvîn hatin çêkirin, 3 koalîsyonên jinan hatin tespît kirin. Li jêr ev koalîsyon tînan raber kirin.

Koalîsyona Jinê ya Enqerê (Ankara Kadın Platformu)

Koalîsyona Jinê ya Enqerê di pêvajoya lêkolînê de ji sendîkavanan, sosyalîstan, siyasethedaran, Kurdan, xwendekaran, femînîstan û/an jî ji aktîvist*ên LGBTI pêk dihat.

Ji Koalîsyona Jinê ya Enqerê İlknur Üstün di hevpeyvîna xwe de balê dikişîne ser pêvajoya damezirandina koalîsyone, ku di salên 2000’î de destpêkê ji hêla rêxistinên jin ên femînîst ve hatiye ava kirin. Di sala 2014’an de zêdetir ji hêla jinên li partiyên siyasî yê cuda û rêxistinên tîkel-zayendî, yê wek konfederasyona Sendikaya Karkeran – KESK’ê – de dixebitin, hatiye bi bandor kirin (Üstün 2014: 34; Axaftina bi aktîvistên AFK- 2014). Wek mînak di dema pêvajoya

² Di asta netewî de koalîsyonên di mijara şidetê de dixebitin: Platforma Jinan a li dijî Şideta Zayendî (*Cinsel Şiddete Karşı Kadın Platformu*), Platforma Dawî li Şidete (*Şiddete Son Platformu*), Platforma Tekoşîna li hember Şidete (*Şiddetle Mücadele Platformu*) Platforma Emê Kuştîna Jinan Bidin Sekinandin (*Kadın Cinayetleri Durduracağız Platformu*), di mijara siyasethê bedênî de: Platforma Kurtaj Heq e, Biryar a Jinan e (*Kürtaj Haktır Karar Kadınların Platformu*) û di mijara karê jinan de: Platforma Keda Jinan (*Kadın Emeği Platformu*)

³ Ji ber ji hev cudabûna wesf û jimarên daneyên azmûnî, pênasayên koalîsyonê –ger hewce hatibe dîtin- bi riya înternetê jî hatin lêkolîn kirin. Di nav van pênasayan de hin valahiyên lêkolînê dê bê dîtin, divê li ser van valahiyên di pêşerojê de bê xebitandin. Ji bo bicîhkirina koalîsyonên jinan hûn dikarin di nivîsa II. a vê raporê de mijara qadên lêkolînê binêrin.

lêkolînê de tevlibûna parlamentera Partiya Gel a Komarê CHP Aylin Nazlıaka di hevpeyvînekê de hat ziman (Kalkan 2014: 48). Di çalakîya 8'ê Adara 2014'an de di bin slogana hevpar „Em serî li hember desthilatdariya mêran, dewletê û sermayeyê natewînin, em berxwe didin!“⁴ de ji 40'î zêdetir rêxistin û ji xeynî wan jinên beyî perwerdeya akademîk ji kolanên derdora Enqerê wek beşdarvan tevî çalakîyê bûbûn (Binder 2014). Di vê çalakîyê de him bi zimanê Tirkî, him jî Kurdî axaftin hatin kirin. Ev him di derbarê tevlibûna jinên Kurd a koalîsyonê de agahî dide û him jî ciheregiya etnîk a li Tirkiyê bi riya beşdarvanan nîşan dide.⁵

Ji Komeleya Piştgirîya bi Namzetên Jin KADER'ê Hatice Kapusuz Kütküt koalîsyona jinan wek avesaziyeke ku hemî rêxistinên jinan ên li Enqerê ji wêdetirê oryantasyona xwe ya siyasî-polîtîk tê de cihê xwe digirin, pênasê dike (Kapusuz Kütküt 2014: 33). Ji bo Gülsen Ülker a ji Weqfa Piştgirîya bi Jinan KDV ev koalîsyon ciheke ku jin tê de him wek endamên saziyên xwe û him jî wek kesayet bi hev re çalakîyan dimeşînin, e (Ülker 2014: 26). Ji bilî rêxistinkirina çalakîyên salane yê koalîsyonê, yê wek 8'ê Adarê Roja Jinan a Navnetewî û 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li dijî Jinê, di dema lêkolînê de koalîsyon di pêvajoyên hiqûqî de jî piştgiriyê dida. Di derbarê kampanyayên tîpîk de herweha di buyerên rojane yê polîtîk de jî koalîsyon helwesta xwe nîşan dide. Wek mînak mijarên li ser qanûna kurtajê, kuştina jinan, bandorên şer ên li ser jinên ji Suriyê û Iraqê tîpîk dest girtin. Ev aktîvîte di civînên ne bi rêk û pêk de tîpîk amade kirin û li ser lîsteya hevpar a peyamê (Mail) tîpîk koordîne kirin (Hocaoğulları 2014: 43). Ji ber ku di medyayê de li ser çalakîyên koalîsyonan ragihandin tîpîk kirin, li gorî Pelîn Kalkan, bandora koalîsyonê ji derve de, li gorî ku wek tîpîk xuya dike, bilindtir e (Kalkan 2014: 48).

Kalkana ku him di Kolektîfa Femînîst a Enqerê û him li koalîsyona jinan de aktîf e, balê dikişîne ser hevkarîya herdu koalîsyonan û herweha nakokiyên navbera wan (Kalkan 2014: 19, 25, 48). Dema aktîvîstên femînîst wek mînak polîtîkaya alîgir*ên jin ên aktîvîstên di rêxistinên tîpîk-zayendî de dixebitin rexne dikin, femînîst jî ji ber ku tevlibûna mêran a li çalakîyan napejirînin ji hêla wan ve wek „bûrjûva“ tîpîk pênasê kirin. Di vê çarçoveyê de Üstün dibêje, ger di koalîsyoneke de bandora aktorên femînîst kêmtir be, ziman û encamên xebatê cuda dibin. Ligel

⁴ „Erkek egemenliğine, devlete, sermayeye itaat etmiyoruz, direniyoruz!“

⁵ Nîqaşên di derbarê xala „etnîsîte’yê ya di navbera aktor*ên tevgerên jinan li Tirkiyê di nivîsa III_3a de hatiye dest girtin.

bandora aktîvîstên têkelzayendî birêxistinîkirî di nav koalîsyonê de bandora femînîstan bi awayekî aşkere zêdetir e. Wek mînak di 8'ê Adara 2014'an de diruşme ji hêla femînîstan ve hat pêş xistin û bi aktîvîst*ên LGBTI ve hevpar hat meşandin (Axaftina bi aktîvîstên AFK re 2014).

Dema Seçin Tuncel a ji Rêxistina LGBTI ji KAOS GL'ê wateya sembolîk a hebûna rêxistineke LGBTI li çalakiya 8'ê Adarê tîne zimên (Tuncel 2014: 56), di hevdîtina bi Kolektîfa Femînîst a Enqerê ya 22.03.2014'an de nêzikatiya aktîvîst*ên LGBTI, ku di çalakiyê de di rêza destpêkê de meşiyar û daxwazên LGBTI bang kirin, hatin rexne kirin (hevdîtina bi AFK re 22.03.2014). Femînîst ragihandin ku çalakvan*ên LGBTI rexneyan nepejirandin û heta femînîstan di têgihiştina zayendî de bi nêzikatiya kevneperest tawanbar kirin.⁶

Ji ber pêkhatiyên heterojen koalîsyon di nav xwe de, li gorî Kalkan, bi „nîqaş“ û „nakokî“ ye (*tartışmalı [...] kavgalı*). Ev ciheregî di heman demê de bi aktör*ên cuda re bihevve karkirinê de fêrî derfeta tevgerandina siyasî dike (Kalkan 2014: 48).

Ligel nîqaşên di navbera koalîsyonê de, yê wek mînak di derbarê pirsên binyata rêxistinbûnê û çarçoveya zayendî, Sevinç Hocaogulları ya ji Rêxistina Malên gel ên têkel-zayendî li gorî bajarên din ên Tirkiyê balê dikişîne ser potansiyela tevgerkirin û berdewamiya têtikiliyan a Koalîsyona Jinê ya Enqerê: „[...] qet nebe, ger bangewazîyeke bê kirin, bingeha wê ya ku rêxistinên jinan bigihîne hev heye.“ (Hocaogulları 2014: 41)⁷ Herweha aktîvîstên ji Kolektîfa Femînîst Enqerê Koalîsyona Jinê ya Enqerê ji Koalîsyona Jinan a 8'ê Adarê ya Stenbolê bi îstîkrartir dibînin (Axaftin bi aktîvîstên AFK 2014).⁸ Bi serê xwe binavkirina Koalîsyonê wek „koalîsyona jinan“ balê dikişîne wateya kategoriya jinê an jî zayendê.

Kolektîfa Femînîst a Enqerê (Ankara Feminist Kolektif)

Kolektîfa Femînîst a Enqerê di dema lêkolînê de ji femînîstên ku di nav Kolektîfa Sosyalîst-Femînîst de bi rêxistinîkirîne û herweha ji femînîstên serbixwe pêk dihat. Aktîvîst vê kolektîfê

⁶ Ji bo analîza têgehên cuda ya kategoriya zayendê yê aktor*ên siyaseta jin û zayendî li nivîsa III_1a binêrin.

⁷ „[...] en azından bir çağrı yapıldığında, kadın örgütlerini bir araya toplayacak bir zemini var.“

⁸ Ji bo pênaseya analîtîk a koalîsyona 8'ê Adarê herweha Kolektîfa Femînîst a Stenbolê binêrin: Binder 2016

ji bo – jinên Trans jî tê de – jinên cuda wek ciheke hevpar dest nîşan dikin. Aktîvîstên jin ên Kurd jî tevî kolektîfê dibin, lê li gorî aktîvîstan, ji rêxistinên têkel zayendî pir kêm beşdarî heye (Axaftina bi aktîvîstên AFK 2014).

Kolektîf di sala 2012'an de ji hêla „kesên bi liv, polîtîk û bi sekneke femînîst“ (*hareketli, politik, feminist söyleme sahip kişiler*) hatiye ava kirin (Özkazanç 2014: 44). Kolektîfa Sosyalîst-Femînîst di civîna yekemîn de, ku di navbera 80 û 100 jin tevî dibinê, bi armanca li Enqerê avakirina saziyeke wek Kolektîfa Femînîst a Stenbolê jinan vedixwîne (Axaftina bi aktîvîstên AFK 2014). Pelîn Kalkan sedema avakirina Kolektîfê wek li jêr dinirxîne:

[...] Wek femînîst li Enqerê jî belavbûnekê me heye. [...] pêdivî bi derketineke rêxistinî heye, erê saziyên jinan hene [...] platform tişt hene, lê pir tişt kêmbûnin, [...] Dema avasaziyeke tune be gotinê hevpar kirin, çalakiya hevpar danîn zehmet dibe. Me wê demê got [...] bila saziyekê, ji tecrubeyên berê, xeletiyên berê ders girtî, ne ku ji nişkev de [...] bi daxuyaniyekê [derkeve], [lê] bi nîqaşên dirêj, di dilê me de rûniştî be. (Kalkan 2014: 3)⁹

Kalkan di gotinên xwe de xwe bi avasaziyên femînîst ve,¹⁰ ku li Enqerê ji salên 1980 vir de hene, girê dide û di derbarê pêşveçûnên dîrokî de bi rexnegirî tevdigere. Di salên 2000'î de girêdanên femînîst ên wek Femînîstên ji Enqerê (*Ankaralı Feministler*) û Em-Femînîst (*FeministBiz*) wek saziyên pêşeng ên Kolektîfa Femînîst a Enqerê dikarin bî dest nîşan kirin.

Piştî banga damezirandinê bi qasî salekê li ser avasaziya rêxistineke guncav a Kolektîfa Femînîst a Enqerê tê nîqaş kirin û ji bilî xalê din serxwebûna aborî tê biryar dayîn. Civînen mehane, ku di dema lêkolînê de bi qasî 20 û 30 jin* tevî dibûn, li Weqfa Piştigiriya bi Jinan KDV an jî li Cafeyên alternatîf pêk tên. Aktîvîst balê dikişînin ser lîsteya e-peyamê ya bi

⁹ „[...] feministler olarak Ankara’da bir dağınıklığımız da var. [...] daha örgütlü bir çıkışa ihtiyaç var, tamam kadın yapıları var, [...] platformlar var filan ama şey çok eksik kalıyor, [...] ortak bir şey söylemek ve ortak eylem koymak zor oluyor bir yapı olmadığı zaman. Dedik o zaman [...] geçmiş tecrübelerden ve hatalardan da ders çıkararak, hemen [...] deklarasyon değil, uzun tartışmalarla hepimizin içine sinen bir yapı olsun.“

¹⁰ Di hevpeyvînan de wek rêxistinên femînîst li Enqerê Weqfa Piştigiriya bi Jinê KDV, Kolektîfa Sosyalîst-Femînîst a Enqerê, Weşangeha *Ayızî Kitap*, herweha Kovara Femînîst *Amargî* hatin bi lêv kirin. Wek femînîstên queer rêxistina LGBTI KAOS GL herweha Navneda Lêkolînên Jin û Zayendî KASAUM a Zanîngeha Enqerê hatin dest nîşan kirin. Li vir taybetiya parçebuyî ya akademîk a tevgera femînîst, ku –ligel Stenbolê- ji 1980'an vir de li hemî Tirkiyê roleke pêşeng dilîze, derdikeve holê.

berfirehtir, ku herweha bi riya medyaya civakî (social media), wek blogên înternetê, Facebook an jî Twitterê, dikarin xwe bigihînin gelek jin*ên din. Herweha bi tevîbûna jinên femînîst a protestoyên Geziyê, ku di sala 2013'an de li Enqerê jî çê bûn, potensiyela femînîst a Enqerê ber bi çavtir buye (Kalkan 2014: 3; Axaftina bi aktîvistên AFK 2014).

Ligel şîdeta li dijî jin*an, bi taybetî zivêr û destavêtin (tacîz û tecawiz) wek mijarên rexneyê yên Kolektîfa Femînîst a Enqerê li hember zayendperestî, herweha homofobî û transfobiya Partiya hikûmetê AKP ne. Ji xeynê komên xebatê yên di derbarê rojeva femînîst de, herweha xebatên lîteratur û arşîvê bi riya rêxistinkirina atolyeyan, ku bi hevkarîya jinên Amerîkî û Ewropî tîn pêş xistin, yên wek dizayna malperan, îngîlîzî û kursên Wendo ¹¹ ji eleqedaran re tîn parve kirin. Salane rêxistinkirina meşa şevê ya femînîst (*8 Mart Feminist Gece Eylemi*) a di roja jinan a navnetewî de tê li dar xistin, herweha mehane rêxistinkirina çalakiya rûniştinê ya li Guvenparkê li hember şîdeta mêr û kuştina jinan di sala 2014'an de giraniya çalakiyên kolektîfê didan der.¹² Konseptên van çalakiyan, ku aktîvist li wir navên jinên hatine kuştin binav dikin û daxuyaniya çapemeniyê didin, dişibe çalakiyên Dayikên Şemiyê, ¹³ ku ji sala 1995'an vir de ye li Stenbolê her şemî çalakiya rûniştinê li dar dixin û wendayên xwe bi bîr tînin û ji dewletê ronîkirina wendabûnên wan daxwaz dikin.

Aktîvistekê AFK di axaftinê de dibêje ku, divê Kolektîf ne wek saziyekê lê wek toreke femînîst bê dîtin. Bi riya Kolektîfê di derbarê pêşveçûnên polîtîkayên femînîst de derfeta danûstendinê çê dibe. Herweha jinên femînîst wek kesayet dikarin tevî Kolektîfê bibin û bi vî awayî siyaseta cîhgir*, ku di Kolektîfa Jinan a Enqerê de tê dîtin, tê red kirin. Ji ber tevîbûna kesayetî û rastiyan cuda cuda yên jiyanên jin*an di navbera aktîvîstan de hişmendiyeke femînîst a yekgirtî tune. Lê li gorî Aktîvistê, da ku desthilatîyên girêdayî *age/generation* neyên pêş xistin, pratîkên femînîst ên hevpar, ku divê di civînên Kolektîfê de bîr berçav girtin, hene (Axaftina bi aktîvistên AFK 2014).¹⁴

¹¹ Xweparastin û Xwe îfade kirina ji bo jinan û keçikan –Wendo- li salên 1970'î de li Kanadayê pêş ket.

¹² Kalkan herweha behsa weşanên amûrên agahiyê ya di derbarê mijara şîdeta li ser jin*an, ku di çarçoveya çalakiyên 25'ê Mijdarê de – ji bîlî yê din – li bajarê Adanayê hatine belav kirin, dike.

¹³ Çalakiya ‚Dayikên Şemiyê‘ bingeha xwe ji dayikên *Plaza de Mayo* ya li Buenos Airesê distîne. Ev jî aliyê transnasyonal ê çalakiyên protestoyî nîşan dide.

¹⁴ Aktîvist ji bo pratîkên femînîst hevûdin guhdar kirin, nixandinên dawî yê bi rêk û pêk û nemeçbûriyeta tevîbûna çalakiyan wek mînak nîşan dide.

Aktîvîstekê ji Kolektîfa Sosyalîst-Femînîst fonksiyona Kolektîfa Femînîst bi ragihandin û rêxistinkirina çalakiyên hevpar pênase dîke: „[...] ew jî her çiqas femînîstên di nav de di xetên cuda de cih bigrin jî di vê platformê de hemî femînîst dikarin xwe tê de îfade bikin û çalakiyên hevpar lidar bixin.“ (Anonîm 2014: 41)¹⁵ Armanca Kolektîfê bihêzkirina meyla femînîst – him di nav jin*ên rêxistinên serbixwe û him jî têkel-zayendî de cîh digrin – e (Civîna AFK ya 22.03.2014). Her çiqas Kalkan firehkirina hişmendiya femînîst di nav rêxistinên têkel-zayendî de wek armanc formule bike jî, ji hêla din de bi mînak çalakiyên 8’ê Adarê – ger hemî bîrdozî û siyaseta tê de cihê xwe bigirin – balê dikişîne – di navtevegira femînîst de – ser xetereya wendabûna radîkalîteyê. Li gorî Kalkan divê platform piştgirî ji siyaseta femînîst re bike, wateya nîqaşên femînîst li Enqerê bilindtir bike û herweha ji bo guhertina hişmendiya civakî çalakiyan bi rêxistin bike (Kalkan 2014: 9).

Li ser nerazîbûnên beşdarbûna mêran a çalakiya 8’ê Adarê ya Kolektîfa Femînîst, herweha di civîna Kolektîfa Femînîst a Enqerê de, ya 22.03.2014’an de jî hat nîqaş kirin. Femînîstên ku him di çalakiya platforma Jinê û him jî di meşa şevê ya 8’ê Adarê de ji bo çalakiyên bê mîr giraniya xwe dane, bi giranî ji hêla mêr*ên çepgirt û queer û herweha ji hêla aktîvîst*ên LGBTI ve (bi zayendperestî ve) hatine sûcdar kirin. Li gorî aktîvîstên femînîst divê ji ber vê sedemê nîqaşên di navbera tevgera femînîst û LGBTI – herweha di mijara têgeha zayendî de – ji nû ve bîr dest girtin. Têne ger Femînîzma Trans* an jî femînîst*ên trans di nav Kolektîfa Femînîst de cihê xwe bigirin, dikare femînîzm xwe pêş bixîne (Civîna AFK ya 22.03.2014).

Da ku berdewamiya beşdaran di civînan û çalakiyan de bê bi dest xistin, di civînan koalîsyonan de avakirina gotûbêjên femînîst (*feminist sohbet*) ên bi rêk û pêk tê fikirîn. Bi vî awayî koalîsyon dikare wek mînak xwe bigihîne xwendekaran an jî jinên ciwan û tîkiliya di navbera akademî û femînîstan bê xurt kirin.

Rewşa ne baş a aborîyê ya Kolektîfê û girêdayî vê tunebûna cîhekê ya ji bo civînan û arşîvkirina çalakiyên koalîsyonê ji hêla hin aktîvîstan ve hat problematîze kirin (Kalkan 2014: 9; Axaftina bi aktîvîstên AFK 2014). Ji ber feraseta takekesî ya femînîzmê berpirsiyariya koalîsyonê li ser

¹⁵ „[...] o da bireysel olarak farklı çizgilerde de olsa tüm feministlerin kendilerini ifade edebildikleri ve ortak eylemlilikler yapabildikleri bir platform.“

milên hin aktîvîstan dimîne. Ev yek ligel di bin kar de mayîne, dikare bibe sedema avakirina avasaziyên hiyerarşik. Ji bo pêşiya vê xetereyê bê girtin di civana Femînîsta Kolektîf a Enqerê, ya 22.03.2014'an de biryara di peywîr girtina çalakî û aktîvîteyan de guhertineke bi rêk û pêk (*eylem ve etkinlik işbölümü değişimi (rotasyon)*) hat girtin. Ev têkiliya bi têşeya rêxistinê herweha ji bo danûstendinên polîtîk di têgehên navendî de ji bo pêşketinê amade bûn, dikarin wek sedemên hebûna stabîl a avasaziyên femînîst li Enqerê bîn şîrove kirin.

Koalîsyona Jinê (ya Enqerê) ((Ankara) Kadın Koalisyonu)

Koalîsyona Jinê (ya Enqerê) di dema lêkolînê de bi qasî 70 rêxistinên jinan û rêxistinên LGBTI pêk dihat (Kapusuz Kütük 2014: 3).¹⁶

Koordînatora Koalîsyona Jinan İlknur Üstün Koalîsyona Jinan wek „platformeke rêxistinbûnê“ (*örgütlenme platformu*) ji bo rêxistinên jin ên serbixwe pênase dike (Üstün 2014: 18). Üstün, ku dema lêkolînê rêvebera KADER'a Enqerê bû, ji bo hîlbijartinên sala 2002'yan bangewaziya avakirina koalîsyonê dike: „[...] damezirandina Koalîsyona Jinan bi bangewaziya min a ku min ji rêxistinên jinan re û jinên ku di vê qadê de dixebitin [...] baweriya me bi wan heye re, şand.“ (Üstün 2014: 18)¹⁷

Di çarçoveya civîna salane ya nîrxandinê û plansaziyên salane yê hevkar hatine formule kirin de bi feraseta rêxistinbûneke berwarî û bêyî cudakirinê, ji bilî tevlîbûna siyasî ya jinan, li ser mijarên hevpar, ên wek qanûnan, dabin kirina avê herweha xalên navnetewî tî xebitandin (Üstün 2014: 12).¹⁸ Koalîsyona Jinan, ku civînên wê yê bi rêk û pêk wek mînak di menzelên kovara femînîst a *Amargî* de li Enqerê tî lidar xistin, di dema lêkolînê de him di asta heremî him jî di asta netewî de aktîf e. Herweha Koalîsyona Jinan da ku perspektîfa zayendî ya civakî (*toplumsal cinsiyet eşitliği perspektifi*) di nav koman de jî pêş bikeve, li hereman bi aktor*ên ji bo mafên mirovan tevdigerin re dixebitin. Ji ber vê yekê bi Platforma hevpar a Mafê Mirovan

¹⁶ Di Rojnameyekê de behsa 110 rêxistinên endam tî kirin. (http://kazete.com.tr/haber/kadin-koalisyonu-cumartesi-toplaniyor_42359). Di derbarê endamên rêxistinê, esas û armancên koalîsyona jinê de, li malpera fermî binêrin; <http://kadinkoalisyonu.org>.

¹⁷ „[...] Kadın Koalisyonunun ilk kuruluşu benim kadın örgütlerine ve bu konuda çalışan [...] birlikte yürümeye güvendiğimiz kadınlara yolladığım çağrıyla başladı.“

¹⁸ <http://ozgur-gundem.com/haber/147792/kadin-koalisyonu-ankarada-toplandi>.

(*Insan Hakları Ortak Platformu*) re hevkarîyeke wê yê nêzik heye.

Koalîsyona Jinê li her çar heremên lêkolînê wek şîrîkê koalîsyonê hat bi nav kirin. Wek mînak hevpeyvînerê ji herema Egeyê qala xebatên Koalîsyona Jinan a li bajarê Muglayê dike (Erozan & Karlı 2015: 41). Nilüfer Akgüna li Komeleya Piştgiya bi Jinan re ya li Deryaya Reş KARKADDER a li Trabzonê aktîf e, Koalîsyona Jinan wek şîrîkê koalîsyonê dest nîşan dike (Akgün 2015: Pirsname). Herweha aktîvîstên Kurd Zîn û Emek ên ji Komelaya Jinan *Selîsê* ya li Diyarbekirê xwe wek endamê koalîsyonê bi nav dikin: „[...] Di nav Koalîsyona Jinan de wek mînak hemî jinên ji Tirkiyeyê hene, angoyê ne ku em bi awayekî hevkar in, ji ber ku [em] pêkhatiyê wê ne, em bi hev re tevdigerin [...]“ (Zin & Emek 2015: 48)¹⁹

Ji ber ku li gorî Üstün tevlihbûna siyasî ya wekhev a jinan armançek e, nikare tenê ji hêla rêxistinekê an jî komeke jinê bê bi dest xistin, lewre bi taybetî di qada siyasî de „yekkirina hêzê“ di navbera jinên Kurd, oldar-muhafezekar, kemalîst û femînîst û herweha kesên LGBTI de bê ava kirin (Üstün 2014: 12). Üstün dest nîşan dike ku, ne hemî rêxistinên endamê Koalîsyona Jinan xwe wek femînîst bi nav dikin. Lewre têgîhiştina pratîkên femînîst di çalakîyên koalîsyonê de, yê wek redkirina hiyerarşî û desthilatdariyê herweha çanda nîqaşê ya di navbera aktor*an de bi wate ye (Üstün 2014: 12). Li ser van pratîkan li ser malpera koalîsyonê, wek „prensîbên xebatê yê koalîsyonê“ ji hemî avasîyên polîtîk serbixwebûn û naskirina nasnameyên cuda tên binav kirin.

Ligel oryantasyonên cuda û heremên xebatê yê cuda rêxistinên jin ên hevkar ji sala 2002’an armanca hevpar, tevlihbûna jinan a qada siyasî û civakî dişopînin. Di vir de pêvajoya xwe tê de dîtî ji bo Koalîsyona Jinê gelek bi wate ye: „ji wê rojê heta îro bi awayên cuda her tim xwe pirsyar kir, bi nîqaş, mijarên polîtîk ên li welêt danî ser masê û [bi vî awayî] xwe jî xist formekê, di heman demê de hewldanên mudaxaleya binyata siyasî ya heyî kir.“ (Üstün 2014: 12)²⁰

Li gorî Hatice Kapusuz Kütküt a ji Komeleya Piştgiya bi Namzetên Jin KADER’ê ya ji Enqerê, Koalîsyona Jinan ajandaya jinan a esasî dişopîne û hewl dide di navbera rêxistinên jinan ên

¹⁹ „[...] Kadın Koalisyonu'nda mesela bütün Türkiyeli kadınlar var, kısmen hani ortaklaştığımız değil, daha çok bileşeni olduğumuz için birlikte hareket ediyoruz [...]“

²⁰ „O günden bugüne kadar da çeşitli biçimlerde sürekli kendini sorgulayarak, tartışarak, memleketteki siyasal konuları masaya yatırarak kendini de biçimledi, aynı zamanda mevcut siyasi yapıya da müdahale etmeye çalıştı.“

cuda de piştgiriyê xurt bike – herweha wan bîne cem hev (Kapusuz Kütküt 2014: 3). Ji xeynê vê li gorî xwenasandina malpera wan, Koalîsyona Jinan ji bo bilindkirina beşdarbûna jinan li hemî qadên civakî, aborî û siyasî dixebite û li dijî polîtîkaya ku li ser hêz û şidetê, cudakirinê tê meşandin pratîkeke polîtîk a wekhev û dadmend hedef digire. Koalîsyona Jinan xwe ji bo saziyên civakî û siyasî yê wê malbat, aborî, civaka sîvîl, partiyên polîtîk û dewletê, wê „tevgereke guhertinê“ (*bir dönüşüm hareketi*) dibîne.²¹

Koalîsyona Jinan, ku di derbarê wê de nîqaşên hundurîn nikaribûn bîne lêkolîn kirin, li gorî daneyên heyî û domdar, û herweha beşdarbûna endaman, dikare wê stabîl bê şîrove kirin. Ji bo stabîlbûna koalîsyonê dikarin ligel avasaziya wê NGO, prensîb û armancên xebatê û herweha fînanse kirina koordînatorekê wê sedem bîne rêz kirin.

1.2 Koalîsyonên Jinan ên Diyarbekirê

Li herema lêkolînê Diyarbekirê di sala 2015’an de neh hevpeyvînên pispor*an hatin kirin û koalîsyoneke jinan li wir hat tespît kirin. Li jêr ev koalîsyon tê nasandin.²²

Kongreya Jinên Azad (Kongreya Jinên Azad)

Kongreya Jinên Azad KJA di sala 2015’an de hat damezirandin (Aktaş 2015: 2). Li gorî Sara Aktaş di salên 1990’an de rêxistinên serbixwe yê wê Navenda Çanda Jinan a Dicleyê û Komeleya Jina Azad destpêkê hatine damezirandin. 2003’an de Tevgera Jinên Azad û Demokrat DÖKH wê „rêxistina sîwan“ (*çatı örgütü*) a aktîvistên Tevgera Jinên Kurd xwe pêş de xist. Dinamîka DÖKH’ê li gorî Sara Aktaş bi taybetî di konferansên salewext de, di plansaziyên salane de, herweha di mekanîzmayên biryardayîne de û di esasên nîqaşê de xwe nîşan dide. Ev koalîsyon ji perspektîfa jinên Kurd hat pêş xistin „[...] hêzekê ku him di asta navnetewî û him jî [...] di nav rêxistinên jinan ên di Tirkiyê de tê nas kirin, temsîlfîyeta wê heye,

²¹ <http://kadinkoalisyonu.org/biz-kimiz-2/>.

²² Platforma Jinan a Diyarbekir/Amedê, ji aktîvistên Tevgera Jinên Kurd, Aktîvist*ên LGBTI û ji nûnerên partî û rêxistinên têkel zayendî pêk tê; di 8’ê Adara 2014’an de li Diyarbekirê çalakiyeke jinan li dar xist. Ji ber ku ev platform tenê ji bo 8’ê adarê hat cem hev, nikare wê koalîsyoneke bê pênase kirin, Lewre jî di vê nivîsê de nayê dest girtin.

kir xwedî nasname.“ (Aktaş 2015: 2)²³

Bi armanca avasaziyeke rêxistinî, ku tê de jin*ên cuda xwe karibin bi îfade bikin, herweha rêxistinbuyînê pêş bixînin, di navbera salekê de pêvajoya nîqaşê ji bo „modela kongreyê“ (*kongre modeli*) tê kirin. Kongreya ku ji delegasyonê, meclîsê û komîsyona çavdêriyê û ji koordînasyona 10 kesan pêk tê, tevlibûna temsîlên hemî qadan, baweriyên, gelan, çandan, fikir û partiyên esas digire (Aktaş 2015: 2). Bi riya rêbazên kotayê temsîla jinên ji taxan (%10) herweha rêxistinên jinan (%5) tê peyde kirin (Alataş 2015: 42). Aktaş rêxistinbuyîna Kongreyê li hemî ,Kurdîstan‘ê dest nîşan dike û ji ber vê yekê jî dibêje li Diyarbekirê – ku wê derê wek navenda Kongreyê pêname dike – tevgerê jinan a serbixwe tune (Aktaş 2015: 23-25).

Ligel komîsyonên jinan ên rêxistinên têkel zayendî, yê wek Partiya Demokratîk a gelan HDP, rêxistinên jinan ên li herema lêkolînê Diyarbekirê tevli Kongreya Jinên Azad dibin. Wek mînak Figen Aras Komeleya xwe Akademiya Jinan wek „pêkhatiya tevgera jinê ya kongrebuyî“ (*kongreleşen kadın hareketinin bir bileşeni*) û nêzîkbûna wê ya bi „Tevgera Azadiya Kurdistan“ pêname dike (Aras 2015: 2). Li gorî Aras, perspektîf û xebatên rêxistinên jinan di koalîsyonê de tîntî entegre kirin, û nûnerên rêxistinên berpirsiyariyên di nav kongreyê de digirin ser milê xwe (Alataş 2015: 23). Li aliyê din Alataş serbixwebûna rêxistinên jinan -ji kongreyê- dest nîşan dike:

[...] em wek sazîyên jinan di nav KJA'yê de ne. [Ger] em daxuyaniya çapemeniyê bidin ji KJA'yê destûrê naxwazin [...]. Em wek temsîl li wir in, lê KJA ji jor de me bi rê ve nabe. [...] Lê ger em daxuyaniyekê bidin, dibêjin: „Pêkhatiyên Sazîyên Jinan ên KJA'yê“. (Alataş 2015: 44-46)²⁴

Aktaş wek mijarên sereke yê Kongreyê, ku di hemî bajarên başûrrojawayê Tirkiyê bi awayekî

²³ „[...] hem uluslararası alanda tanınan, hem [...] Türkiye'de kadın örgütleri içerisinde tanınan, bir temsiliyeti olan, bir gücü olan aslında bir kimlik haline geldi.“ Di nivîsa III.2.A. de tê dîtin ku ev nêrîna Tevgera Jinên Kurd ji hêla gelek aktor*ên siyasî ya jin û zayendî jî tê parve kirin.

²⁴ „[...] biz KJA'nın içerisindeyiz kadın kurumları olarak, bir basın açıklaması yapacağız, KJA'dan izin almıyoruz [...]. Biz orada kendimizi temsilen de oradayız ama KJA üstten bizi yönetmiyor. [...]. Ama nasıl bir açıklama yaparız, deriz ki: „KJA kadın kurumları bileşenleri.“ Ji bo bihêz kirina rêxistinbûnên sazîyên jinan li Diyarbekirê di dema lêkolînê de bi qasî 10 rêxistinên jin her sê mehan carekê berdevkên nû hildibijartin. Ev berdevk berpirsiyariya şopandina pîrsgirêkên jinan a li bajêr, rêxistin kirina civînan digre ser milê xwe û herweha ji bo xebatên çapemenî û raya giştî berpirsiyar e (Alataş 2015: 29).

wekhev tên dest girtin weha bi rêze dike: Şîdeta li dijî jinan û kuştina jinan, beşdariya siyasî ya jinan herweha çalakiyên transnasyonal ên wek 8'ê Adarê û 25'ê Mijdarê. Di derbarê van mijaran de wek mînak kampanyayên destnîşankirinê (îmzayê), yên wek „ji femînîzîd re na!“ (*kadın kırımına hayır!*) an jî „namûsa me azadiya me ye!“ (*namusumuz özgürlüğümüzdür!*) tên rêxistin kirin, bi riya SMS'ê û e-peyamê herweha bi nûnerên rêxistinên û bi kongrê re danûstendin tê çekirin (Alataş 2015: 42; Aktaş 2015: 2). Herweha saziyên komunal ên navendên jinan û rêxistinên jinan ên serbixwe ji bo bicîhkirina armancên polîtîk ên KJA'yê bi wate ne (Aktaş 2015: 2, 17).

Aktaş wek serketiyên Tevgera Jinên Kurd sîstema hevserokatî²⁵ û herweha di rêveberî û siyasetê de bicîhkirina %40 kotayê bi nav dike. Wekî din di pêvajoyên biryardayîna de bandora giring a Tevgera Jinên Azad û Demokrat bi lêv dike. Vekirina Akademiya Jinan û pêşxistina „zanista jinê“ *jineolojiyê* jî ji bo bilindkirina hişmendiyê (ya akademîk jî) li heremên Kurdan navendî dibîne (Aktaş 2015: 2).

Li gorî Aktaş li Diyarbekirê ji ber vê yekê ji bilî kongreyê rêxistin an jî tevgerê jinê ya cuda tune ye (Aktaş 2015: 23). Herweha Mukaddes Alataşa ji Komeleya Jinan *Kardelenê* di hevpeyvîna xwe de Kogreya Jinên Azad wek avasaziyekê ku di derdora wê de hemî rêxistinên jin û zayendî –herweha komeleya wan a jinan bi xwe- dikarin cih bigirin, pênase dike (Alataş 2015: 25).²⁶

Li gorî Dilan Çiçek a ji rêxistina LGBTI KESKESORê Tevgera Jinên Azad û Demokratîk DÖKH ku ji hêla wê ve domînant tê dest nîşan kirin, rêxistina berê ya Kongreya Jinên Azad KJA ye û wê wek temsîla Tevgera Kurd pênase dike (Çiçek & Gülen 2015: 5, 14). Aktîvîsta LGBTI ji dêl daxwazên siyasî yên di derbarê jin û zayendî, pêş derxistina xweseriya etnîk a aktîvîstan rexne dike.²⁷ Li gorî têgihiştina aktîvîsta Kurd Alataş be yî di heman demê de di ‚tekoşîna azadiyê‘ de cîh girtin, çalakiyên siyasî yên jin û zayendî nikare bê kirin (Alataş 2015: 13).²⁸ Têgeha femînîzmê, herweha li gorî Al-Rabholz, „ji bo femînîstên Kurd ne tenê siyaseteke jinê ya

²⁵ Ji vê têgehê rêveberiya ji jin û mêrekê ve tê pratîze kirin, tê fêhm kirin.

²⁶ Navenda Jinê KAMERA ku ji hêla Nebahat Akkoç ve di sala 1997'an hatiye ava kirin, xwe wek saziyeke femînîst û xweser –ji mêran û ji rêxistinên têkel zayendî- pênase dike. Ev rêxistin ne endamê Kongreya Jinên Azad e. (<http://www.boell.de/de/2014/12/09/anne-klein-frauenpreis-2015-geht-nebahat-akkoc-aus-der-tuerkei>).

²⁷ Nîqaşên di derbarê xala ‚etnîsîte‘yê ya di navbera aktor*ên tevgerên jinan li Tirkiyê di nivîsa III.3.A. de hatiye dest girtin.

²⁸ Ji bo xwepênasekirin û pênasekirina derveyî ya Tevgera Jinên Kurd li nivîsa III.2.B. binêrin.

girêdayî zayendî ye“ lê belê „ligel zextên din cudahiyên etnîk, çînî û nijadî ya di nav jinan de“ (Al-Rebholz 2013: 262) digire ber çav. Tevgera Jinên Kurd bi vî awayî nijadperestî û netewperestiya li nav dewletê û civakê herweha , nêzikatiyên etnosentrîk ên ‚femînîzma Tirk‘ rexne dike.

Aktaş û Alataş di wê baweriyê de ne ku, „rêxistineke bingehîn û xweser“ (*özgün ve özerk bir örgütlenme*) bi pêvajoyên biryardayînê yên hevpar di navbera kongreya nû hatiye avakirin de ji bo serkeftina tekoşîna jinê esasî ye: „Divê em hêzên xwe bigihînin hevdû, [...]divê em li dora vê perspektîfê bicivin [...]“(Alataş 2015: 5, 42; Aktaş 2015: 2)²⁹ Pêşketina rêxistinbûneke maqûl dikare wek faktoreke ji bo qewînbûna çarçoveyê bê şîrove kirin. Di çarçoveya nirxandina Çîçek de KJA dikare wek rêxistineke sîwan a Tevgera Jinên Kurd, ku bi taybetî xwe bi nasnameya etnîk ve girê dide, dikare bê analîze kirin û bi vî awayî hebûna wê ya wek koalîsyoneke ku bîrdozî û siyasetên cuda û hevkar*ên serbixwe jî di nav xwe de dihevwîne, dikare bê pirsyar kirin.

1.3 Koalîsyonên Jinan ên Herema Egeryê

Ji bo qadên lêkolînê, Denizli û Muğlayê, ku li herdu deran di sala 2015’an de 20 hevpeyvînên pispor*an hatin kirin, sê koalîsyonên cihê herweha koalîsyoneke heremî karibûn bèn tespîtkirin. Li jêr dê ev koalîsyon bèn pêşkêş kirin.

Platforma Piştgiriya bi Jinan a Denizliyê (Denizli Kadın Dayanışma Platformu)

Ev platform di sala 2007’an de ji hêla aktîvîstan ve bi armanca „li Denizliyê gotin û daxwazên jinan bèn bihîstin“ (*Denizli’de kadınların sözlerinin ve taleplerinin duyurulması*) û bi taybetî di mijarên şîdet û kedxwariyê de ji bo yekbûna tevgera jinan hat damezirandin.³⁰ Li gorî aktîvîstekê ku dixwaze anonîm bimîne, bi bihêzbûna tevgera jinan a li hemî welêt a di nav deh salên dawî de platform jî xurt buye. Di salên dawî de dîsa platforma ku tevgerên jinên li Tirkiyê û pêşketinên siyasî û civakî yên guncav ên li hemî cihanê dişopîne, ji tevgera jin a

²⁹ „[...] güçlerimizi birleştirmemiz lazım, [...] bu perspektif etrafında örgütlenmemiz lazım [...].“

³⁰ Ji bo xwepênaseya koalîsyonê li pela Facebookê binêrin: https://www.facebook.com/Denizli-Kad%C4%B1n-Dayan%C4%B1%C5%-Platformu-218465884891191/about/?ref=page_interna.

Denizliyê re aliyeke dinamîk daye. Di dema lêkolînê de platform – li gorî dema avabûnê – kêma ji jinên serbixwe, zêdetir ji jinên rêxistinên têkel zayendî, çepgirt, ên wek Partiya Piştgirî û Azadiyê ÖDP an jî Partiya Komunîst a Tirkiyê TKP pêk dihat (Anonîm 2015: 6-10).

Aktîvîsta him di platformê de him jî di Partîya Demokrat û Sosyalîst SDP ya têkel zayendî de cihê xwe digire, dibêje her çiqas di komên têkel zayendî de bi rêxistinkirî bin jî „em ‘wek malbatekê’ tevdiagerin, [...] serê me hemuyan bi heman awayî dişuxule. (Anonîm 2015: 15)³¹ Aktîvîstê di hevpeyvînê de dest nişan dika ku, aktîvîstên Platforma Serbixwe ya Piştgiriya bi Jinan a Denizliyê nasnameya xwe ya siyasi ya rêxistinên xwe li paş xwe dihêlin û ji bo nirxên tevgera jin û femînîst xwe dikin yek (Anonîm 2015: 16). Ji ber vê yekê di salên dawî de „çalakiyên bê nav“ (*isimsiz eylemlilikler*), ango çalakiyên siyasî yên jin û zayendî bêyî binavkirina rêxistinên an jî sembolan hatine organîze kirin (Anonym 2015: 150). Hevpeyvîner wek prensîba herî esasî ya platformê serbixwebûna aktîvîstan a li hember mêran dest nişan dika: „[...] tekoşîna jinan an jî çalakiyên me yên li kolanan bi jinan re, tenê bi jinan re [...]“ (*[...] sokakta kadın mücadelesini ya da eylemlerimizi kadınlarla, sadece kadınlarla [...])* tên meşandin (Anonîm 2015: 6-8). Ji bo hişmendia platformê herweha di destpêkê baweriya tevgera jin a femînîst esas e „gotina jinê esas e“ (*kadının beyanı esastır*) (Anonîm 2015: 9-10).³²

Wek mijarên platformê; şîdeta li dijî jinan, wek mînak kuştina cinsî a Özgecan Aslan a sala 2010’an an jî pêşkêşiyên medyayê yên di derbarê şîdeta cinsî – wek mînak TV-fîlma „Sûcê Fatmagul çi ye?“ – ku di navbera 2010 û 2012’an de hate nişan dayîn, zewacên bi mehra olî, herweha çalakiyên transnasyonal ên wek 8’ê Adarê û 25’ê Mijdarê ji hêla aktîvîstên platformê tên bi lêv kirin (Anonîm 2015: 9-10). Ayşe Balkanay a ji Komeleya Jinên Karmend GİKAD’ê di hevpeyvînê de herweha behsa perwerdeya di derbarê mafên jinan de, ku ji hêla aktîvîstên platformê hatiye amade kirin, dika (Balkanay 2015: 12). Wekî din li ser pela Facebookê ya platformê wek mijarên sereke reformên hiqûqî û aştî tên bi nav kirin.

Bi armanca di navbera jinan de diyalog, danûstendin û piştgirî pêş bikeve platform her sal

³¹ „bir aile gibi hareket ediyoruz, [...] hepimizin kafası aynı yerden çalışıyor.“

³² Femînîst dibêjin divê di mijara şîdeta cinsî de îfadeyên mexdûrê bê esas girtin.

meşa şevê ya femînîst di roja 8'ê Adarê de bi rêxistin dike û herweha bê rêkûpêk be jî „şeveke ji bo piştgiriya bi jînê“ li dar dixê (*kadın dayanışma gecesi*) (Anonîm 2015: 122). Platform herweha –ji îdeolojî, nijad, ziman û baweriyê serbixwe- balê dikişîne ser cudakirin (dîskrîmîne kirin) û çewsandina jinan û bi vî awayî xizmeta berfirehkirina perspektîfên femînîst dike (Anonym 2015: 19).³³

Platforma Jinan a Denizliyê (Denizli Kadın Platformu)

Li gorî Gülizar Biçer a ji Komîsyona Mafên Jinan a Baroya Denizliyê di Platforma Jinan de, ku di nîvê salên 2000'an de hatiye ava kirin, 22 Komeleyên Jinan cihê xwe digirin.³⁴ Li gorî nêrîna aktîvistên ji Platforma Piştgiriya bi Jinê ya Denizliyê jinên ku di nav Platforma Jinan a Denizliyê de cihê xwe digirin bi giranî ji partiyên saziyên wek Partiya Karker*an ÎP, ji Komeleya Nêrînên Ataturkparêz ADD, herweha ji Partiya Gel a Komarê CHP ne, û destpêkê wek Kemalîst tên pêname kirin (Anonîm 2015: 19). Ev platform di çarçoveya çalakiya Platformê ya 8'ê Adarê de li Denizliyê bi awayekî sembolîk çeleng datîne ber peykera damezerînerê dewletê Mustafa Kemal Atatürk, herweha sirûda netewî tê xwendin.

Li gorî Biçer, Platform bi taybetî li heremên deştî û herweha li taxên feqîr xebatên xwe didomîne û wekî din ji hêla Wêzîrê Perwerdê ya Tirk tê destek kirin. Di sala 2005'an de li Denizliyê 1. Festîvala Filmê ya Jinan bi alikariya Waliyê wê demê hat li darxistin.³⁵ Nêzîkbûna platformê bi rêveberiyê re xwe di hevkarîya bi komîsyona jinê ya Meclîsa Şaredariya bajarê mezin Denizliyê de nîşan dide.³⁶ Civînên wek mînak di derbarê mafê jinan û şidetê de herweha bi hevkarîya Zanîngeha Pamukkaleyê tên li dar xistin.

Ev çalakî di civînên mehane yê rêxistinên endam û bi berdevkên platformê – Nurten Karakiş (ji Komeleya Parastina Mafê Jinan), an jî Gülnur Oymak (ji Komîsyona Jinan a Meclîsa Bajêr) - ve tên organîze kirin. Di dema lêkolînê de berdevka platformê Cennet Kasapoğlu ku di heman

³³ Ji ber kêmasiya çavkaniyan herweha daneyên azmûnî di derbarê nîqaşên nav koalîsyone de û stabîlîteya koalîsyonê de agahî bê dayîn. Ev yek bi taybetî ji bo pênameya Platforma Jinan a Denizliyê, Hevciwîna Jinên Egeyê û Koalîsyonen Herema Deryaya Reş derbasdar e.

³⁴ <http://bianet.org/bianet/kadin/30719-kapali-da-olsalar-kapilari-zorlamaliyiz>.

³⁵ <http://bianet.org/kadin/kultur/71908-kadinlar-filmlerde-kendini-buldu>.

³⁶ <http://denizli.bel.tr/Default.aspx?k=haber-detay&id=15633>.

demê de Seroka Komeleya Jinên Komarê ye, di çalakiyê de têgihîştina xwe ya Jinê bi vî awayî şîrove dike: „Jin dayik e, ked e, hezkirin e, dilovan e. Jin rêzgirtin e, fedakarî ye, welêt e. Li pişt her bedewiyê ruyê jinê ya bi ronahî heye.“³⁷ Ev gotin veguhestin û îdealîze kirina jinan, dibe ku di nav platformê de bandora wê li ser çêkirina nasnamê hebe, dide xuya kirin.

Platforma (Piştgiriya bi) Jinan a Muğlayê (Muğla Kadın (Dayanişma) Platformu)

Platforma (Piştgiriya bi) Jinan a Muğlayê di navbera 2003 û 2004'an de hat damezirandin. Di destpêka avakirinê de ji gelek aktor*ên bi siyaset û bîrdoziyên cuda pêk dihat. Wek mînak Koma Piştgiriya bi Jinan a Muğlayê, Komeleya Destekdayîna Jiyana Hemdem ÇYDD ya Kemalîst, Komeleya -oldar û muhafezekar- Jin û Malbatê *Gökkuşığı*, Endamên Zanîngeha Muğla Sıtkı Koçman, herweha komîsyona jinan a Meclîsa bajêr endamên platformê bûn (Kılıçoğlu 2004, p. 53). Dîsa lîsteya beşdarên çalakiya 25'ê Mijdar 2014'an ciheregiya platformê dide der.³⁸ Di dema lêkolînê de jinên ji sendika û partiyên têkel zayendî û çepgirt, wek mînak ji KESKê û ÖDP û herweha ji komên ekolojîk jî di nav çalakiyên platformê de cihê xwe digirtin, ligel vê komeleya oldar-muhafezekar Komeleya Jin û Malbatê *Gökkuşığı* êdî tevî platformê nabe.

Ji Weqfa Navenda Jinê KAMERê Gaye Cön dibêje ku Platforma Jinan a Muğlayê ji Koma Piştgiriya bi Jinan a Muğlayê hatiye pêş xistin (Cön 2015: 2). Kılıçoğlu jî behsa yekemîn koma femînîst a Muğlayê ya di sala 1989'an de hatiye ava kirin -ku Cön jî yek ji damezerîneran e- dike, ev platform di nîvê salên 2000'î de wek Platforma Piştgiriya bi Jinê tê bi nav kirin (Kılıçoğlu 2004, S. 43). Kılıçoğlu di lêkolîna xwe ya derbarê rêxistinên jinan de balê dikişîne ser rola navendî ya akademîsyenên femînîst Ayşe Durakbaşa û Nurgün Oktik, ku di dema lêkolînê de li Zanîngeha Muğla Sıtkı Koçman dixebitîn (Kılıçoğlu 2004, S. 54).³⁹

Platform ji xeynî mijarên şidet û ekolojîyê bi taybetî bi beşdarbûna siyasî ya jinan ve mijûl

³⁷ <http://www.denizliekspres.com/denizli-gundem/denizli-valiligi/5985/>. „Kadın anadır, emektir, sevgidir, şefkattir. Kadın saygıdır, fedakarlıktır, vatandır. Her güzelliğin arkasında kadının aydınlık yüzü görünmektedir.“ Ji bo têgihîştina „Jinbûn'ê ya aktîvîst û tevgerên jinan li nivîsa III.1.A. binêrin.

³⁸ <http://www.muhalafet.org/haber-muglada-kadinlar-gericilige-meydan-okudu-0-12827.aspx>.

³⁹ Li beramberî (kêm)hejmara niştecihan, bajarê Muğlayê bi Komeleya Jinan *Karyayê*, Femînîstên Vegan û bi koma xebatê ya femînîst di dema lêkolînê de di avasaziya femînîst de roleke bi wate dilîze.

dibe. Bi vî awayî platform wek mînak di sala 2004'an de formata civînê ya ji hêla Koma Piştgiriya bi Jinê ve di salên 1990'î de hatiye li dar xistin, pêş dixîne. Ango di hilbijartinên heremî de bi listeyekê daxwazên jinan ji namzet*an re dişîne. Cön, Mala Piştgiriya bi jinê ya taxa Sekibaşiyê, ku tê de civînen platformê tèn çêkirin, wek encama serkeftî ya çalakiyên platformê û hevkarîya bi rêveberîya heremî dest nîşan dike (Cön 2015: 8). Di wir de kursên xwendin û nivîsandinê, ji bo azadiya aborî ya jinan kursên destkariyê û ji bo nasnameya jinan „xebatên hişmendiyê“ (*farkındalık çalışmaları*) tèn meşandin.

Di dema lêkolînê de platform ji bo 8'ê Adarê, 1'ê Gulanê û 25'ê Mijdarê çalakiyan organîze dikir û herweha di koordînasyona meşa jinên cihanê de li ser navê bajarê Muğlayê bi xala „tekoşîna ekolojîk“ (*ekolojik mücadele*) cihê xwe girt.

Di daxuyaniyeke çapemeniyê ya 19.02.2004'an de armancên platformê bi vî awayî tèn rêze kirin: di navbera rêxistinên cuda yên li Muğlayê û li Tirkiyê xurtkirina torên ragihandin û piştgiriye, pêkanîna projeyên hevpar û aktîvîteyên lobiyê (Kılıçoğlu 2004, S. 53). Gelek hevpeyvîner*ên li Muğlayê di nav xebatên platformê de cihê xwe digirin û tevî çalakiyên wê dibin. Ev dîtina azmûnî stabîlîteya platformê ku ji 15 salan vir de ye heye, dest nîşan dike.

Hecivîna Jinên Egeyê (Ege Kadın Buluşması)

Yekemîn hecvîna Jinan a Egeyê di sala 2004'an de li Muğlayê bi alîkariya aborî ya Weqfa Heinrich Böll ku nêzî Partiya Almanan a Keskan (BÜNDNIS 90/DIE GRÜNEN) e, li hev kom bû. Gorî ku Gaye Cön tîne zimên, hevdîtin li ser daxwaza Jinên ji Denizli û Aydinê bi hevkarîya aktorên giring ên wek Nazik Işık, Güler Dost û Nebahat Akkoç re hat çêkirin. Cön armanca vê hevdîtinê wek hevdû naskirin, danûstendin û lihevghandina rêxistinên siyasî yên jin û zayendî li herema Egeyê, bi lêv dike (Cön 2015: 30-32).

Endema Komeleya Parastina Mafê Jinan û CHP'ya Denizlîyê Nurten Karakış di sala 2015'an de koordînatoriya 9. Hecivîna Jinan dikir. Di vê civînê de komeleyên di tevger(ên) jin ên Egeyê de cihê xwe digirin –ji heft bajaran Uşak, Aydın, Denizli, Kütahya, İzmir, Muğla und Manisa- bi akademîsyenan re li hev rûniştin (Balkanay 2015: 46; Karakış 2015: 37). Li gorî Ayşe Balkanay,

ji ber ku di asta netewî de rêxistin bi tena serê xwe ne bi hêz in, ew dikarin bi riya platformên heremî rojevên xwe yê derbarê jin û zayendî wek mînak, kar û xebata jinê herweha beşdarbûna jinê ya siyasî, bişopînin (Balkanay 2015: 46).

Her çiqas di avakirina koalîsyonê de bandora aktîvîstên femînîst giran be jî, ew êdi di sekreterya hevcivîna 9. de berpirsiyarî nagirin. Di sala 2008'an de 8. Hevcivîna jinên Egeyê ji hêla Meclîsa Jinan a Muğlayê tê rêvebirin û 60 sazî û kes başdarî vê civînê dibin, lê Cön ji bo civînê nayê vexwendin. Ew redkirina xwe ya hevcivînê bi vî awayê dinirxîne: „[...] netewperest bandora xwe lê xisti bûn, min got, ez [tê de], tune me' [...] hêzên desthilatdar dixwazin me tune bikin. Ez qet acis nîn im, ya pêwîst ew e ku [mirov] tiştekî bide dest pê kirin [...]“ (Cön 2015: 34)⁴⁰

Rexneya bingehîn a Cön di derbarê bandora „netewperest“ an li ser koalîsyonê ye. Li gorî wê netewperest (*ulusalcılar*) bi nêzikatiya xwe ya bi dewletê – Cön ji bo vê yekê di çalakiyan de xwendina sirûda netewî û ji bo hevcivînê vexwendina Waliyê Manisayê wek îspat dest nîşan dike – dibin sedema hiyerarşiyê û ji jinên sergirtî û jinên Kurd* xwe dûr dixînin, lewre jî nikarin ji bo platformê wek hevkar bên dîtin.

Hevcivîna Jinên Egeyê di dema lêkolînê de wek komcivîneke lawaz û kemalîst dikare bê pênase kirin.

1.4 Koalîsyonên Jinan ên Herema Deryaya Reş

Li gorî daxuyaniya Nurber Gürdal li bajarê mezin Trabzonê 20 rêxistinên jinan hene (Gürdal 2015: 32), ligel vê hin pispor* li bajarên piçûk Artvîn û Hopayê hebûna tevgerê jinan a serbixwe ne pejirandin (wek mînak Arıcı & Anonîm 2015: 57). Lê ev lêkolîn di dema lêkolînê 2015'an de pêşketina avasaziyên jin û zayendî dide der. Di çarçoveya lêkolînê de li qadên lêkolînê, li Trabzon, Artvin û Hopayê, ku di sala 2015'an de bi 20 pispor* an hevdîtin hatin

⁴⁰ „[...] damgasını vurmuştu ulusalcılar, dedim ki ,ben yokum' [...] [...] egemen güçler bizi yok etmeye niyetliler. Ben de hiç rahatsız değilim, önemli olan bir şeyi başlatmak [...]“

çêkirin, çar koalîsyonên heremî hatin tespît kirin, li jêr ev koalîsyon tên pêşkêş kirin.⁴¹

Platforma Jinan a Trabzonê (Trabzon Kadın Platformu)

Platforma Jinan a Trabzonê di dawiya sala 2000'an de ji hêla 13 komeleyan ve hate damezirandin (Bostan 2015: 57; Şirin 2015: 27). Di rojnameya înternetê bianet.org'ê de Komeleya Dayikên Tirk, le herweha koma femînîst, Komeleya Piştgiriya bi Jinê ya Deryaya Reş KARKADDER jî wek hevkarê platformê hatine nivîsandin (bianet 2009). Ji Komîsyona mafê jinan a baroya Trabzonê Bahar Bostan jî, endamên jin ên AKP herweha yê MHP wek beşdarên aktîv ên platformê bi nav dike.

Ji Komeleya Navenda Jinê *Yaşam* Nurber Gürdal dibêje ev platform bi armanca li Trabzonê „li ser esasa jinê“ (*kadın paydasında*) kombûnê hatiye ava kirin (Gürdal 2015: 32). Bi vî awayî bi kampanyaya platformê ya bi navê „40 tax 40 keyayên jin“ (*40 Mahalle 40 Kadın Muhtar*) ji bo beşdarbûna siyasî ya jinan piştgirî hatiye dayîn.⁴² Herweha ji bo platformê bernameya Netewên Yekbuî ya bi navê „bajarên hevalên jinan“ (*kadın dostu kentler*) gelek giring e û ev alikariya aktor*ên dewletê jî dest nîşan dike.⁴³

Ji Komeleya Piştgiriya bi Jinê ya Deryaya Reş Nilüfer Akgün di hevpeyvînê de balê dikişîne ser derfetên koalîsyonê yê aktor*ên siyaseta ya jin û zayendî: „kî di tevgera jin de cihê xwe bigire [...] mirov dikare pêre hevkarîyê bike.“⁴⁴ Lê Akgün kêm bûna „perspektîfeke jinê“ (*kadın bakış açısı*), ku ji bo wê tê wateya redkirina cudakirina etnîk, çand û oryantasyona zayendî, ya hin hevkarên platformê jî rexne dike. (Akgün 2015: 18). Pelin Şirina ku di HDP de aktîf e, girêdayî Akgün oryantasyona netewî û netewperest hin komeleyên platformê rexne dike, ku ew jinên Kurd an jî kesên ji îdeolojiyên din wek „ya/yê din“ dibînin (Şirin 2015: 35). Ji ber vê

⁴¹ Komeleya Platforma Jinan a Deryaya Reş li Trabzonê KIKAPê -wek Hevcivîna Jinên Egeyê koalîsyoneke cihî- di înternetê de hat dîtin. (<https://www.facebook.com/pages/Karadeniz-İlleri-Kad%C4%B1n-Platformu-Trabzon-Derne%C4%9Fi-K%C4%B0KAP-Trabzon/412965378833477>). Lê ji ber ku di hevpeyvînan de di derbarê vê koalîsyonê de tiştek nehate gotin û ji bo siyaseta jin û zayendî li heremê xwedî rolekê nîn e, li vir wek koalîsyon nehat dest girtin.

⁴² <http://bianet.org/kurdi/toplumsal-cinsiyet/113105-trabzon-kadin-platformu-yla-12-kadin-muhtar-adayi-secime-hazirlaniyor>.

⁴³ http://www.unfpa.org.tr/rapyay/kadin_dostu_kentler_2010.pdf.

⁴⁴ „Kadın hareketinde kim varsa ortaklık yapılabilir.“

yekê li gorî perspektîfa wê ev koalîsyon ne xwedî fonksiyon e, zêdetir girêdayî xebatên kesane yên komeleyên jinan dimeşe. Li gorî aktîvîstê Rêxistina LGBTI *Mor Balık* a li Trabzonê Fırat Varatyan di platformê de oryantasyona siyaseta jin û zayendî kêm e û bi vî awayî platformê wek ,lihevciwînên ji bo vexwarina qehweyê‘(Varatyan 2015: 66) ye.

Platforma Demokratîk a Jinan a Trabzonê (Trabzon Demokratik Kadın Platformu)

Li gorî Bahar Bostan, aktîvîst*ên Platforma Jinan a Trabzonê ji her nêrînên siyasî û bîrdozî di nava xwe de dihewîne. Ligel vê Platforma Demokratîk a Jinan bi giranî ji hêla jinên sosyalîst an jî sosyal-demokrat tê birêve birin: „[...]wek şaxa jinê ya siyasetekî giştî tev digerin.“ (Bostan 2015: 57, 85)⁴⁵ Ji Kolektîfa Jinan a Zanîngeha Trabzonê Seda Kenanoğlu behsa rêxistinên jinan ên çepgirt û demokratîk dike. Lê platform ji bo herkesî vekirî buye: „Ji bo beşdarbûna civînan endama komekî buyîn ne pêwîst e. Jineke ji rêzê jê dikare tevî civînan bibe.“ (Kenanoğlu 2015: 35)⁴⁶ Kenanoğlu di hevpeyvînê de dest nîşan dike ku jinên di nav AKP an jî MHP de rêxistin kirîne tevî platformê nabin.

Ji bilî wateya pêvajoyên biryarê yên hevkar, ku rêxistin ji hêlekê ve tê de cihê xwe digirin, ya herî pêwîst ji bo platformê serbixwebûna wê ya aborî ye. „ [...] bi bexşînê tiştek nikare bê kirin. Tekoşîna jinê ji kolanan tê, ji çiyayan tê.“ (Bostan 2015: 65) ⁴⁷ Ji ber vê yekê, li gorî Bostan, li ser esasa prensîba xweseriyê xebata hevkar bi komîsyona jinê ya meclîsa bajarê mezin tê red kirin, lewre: „ [...] saziyeke ku bi tu awayî bi sîstemê re nakeve têkiliyê [ye].“ (Bostan 2015: 81, 83)⁴⁸

Li gorî gotina Kenanoğlu, platform bi taybetî di hefteya 8’ê Adarê û 25’ê Mijdarê civînan bi rêxistin dike, wek mînak çalakî ji bo şîdeta li hember jinê û kuştina jinan an jî li hember qanûna kurtajê, herweha ji bo bazirganên bazara jinan li Trabzonê hewldanên rêxistinîkirinê çê bûne. (Kenanoğlu 2015: 35, 43). Ev nêzikatî nîşan dide platform bi aktîvîteyên xwe yên derbarê siyasatên jin û zayendî dixwaze bala xwe bide ser jinên ku di nav jiyana aborî ya bajarê

⁴⁵ „[...] genel bir siyasetin kadın kolu gibiler.“

⁴⁶ „[...] bir topluluğa üye olmanız gerekmiyor toplantılarına katılmak için. Sıradan bir kadın olarak da toplantılarına katılabiliyorsunuz.“

⁴⁷ „[...] hibeyle bir şey yapılmaz, [...] kadın mücadelesi sokaktan gelir, dağdan gelir.“

⁴⁸ „[...] hiçbir şekilde sistemle iletişime geçilmeyecek diyen bir yapı.“

de cihê xwe digirin, lê rêxistina xwe ya jinê li dar nexistine. Herweha li gorî nûçeyên medyayê Platforma Demokratîk a Jinan a Trabzonê bi koroya jinên demokratîk konseran organîze kiriye, wekî din ji ber kuştina Özgecan Aslan çalakîya meşê li dar xistiye, tevlibûna meşê bi riya belavok, e-peyam û *Social Media* hatiye sazî kirin (Kenanoğlu 2015: 45). Li gorî Bahar Bostan platform ji bilî aktîvîteyên 8'ê Adarê, ku ji hêla jinên Rêxistina Malên Gel tîne organîze kirin, gelek kêr çalakîyan çê dîke (Bostan 2015: 36, 73).

Akademîsyen Şahînde Yavuz ku di heman demê de li Komeleya Piştigirîya bi Jinê KARKADDERÊ aktîf e, di hevpeyvîna xwe de danûstendina navbera rêxistinên jinan wek armanca damezirandina platformê pê nase dîke. Bi vî awayî divê têkilî û ragihandinên di navbera rêxistinên jinan li Trabzonê bê parastin û rêxistin ji xebatên hevûdu agahdar bibin. Ji bilî vê, li gorî nêrîna wê, bi riya liv û tevgera siyaseta hevpar wek mînak zêdetir bandor li ser meclîsa bajêr an jî walîtiyê dikare bê kirin: „Ger em bi hev re tev bigerin, me digirin ber çavan. Lê dema em wek kesan tev bigerin, car caran ji me hez dîkin, car caran hez nakin, le dema platformekê [li hember wan] be derfeta wan a nehez kirinê çê nabe.“ (Yavuz 2015: 5)⁴⁹

Platforma Piştigirîya bi Jinê ya Artvînê (Artvin Kadın (Dayanişma) Platformu)

Özge Zeynep Arıcı, sekretera sendîkaya perwerdeyê Eğitim-Senê di hevpeyvîna xwe de wek armanca damezirandina vê platforma piştigirîya bi jinê – girêdayî 8'e Adara 2015'an – dest nîşan dîke: „[...] me got [...] em li herkesî bigerin, hemî komeleyan, [...] hemî sendîkayan, rêxistinên civakî, em tişekî hevpar li dar bixin.“ (Arıcı & Anonîm 2015: 75)⁵⁰ Civîna yekemîn bi tevlibûna 10 rêxistinên çepgirt hat li dar xistin. Lê dema sibata 2015'an kuştina Özgecan Aslan diyar bû, rêxistinên kemalîst, wekî sendikaya Eğitim-İş, an jî partiya CHP, herweha partîya netewperest MHP tevlibû çalakîya li hember şîdeta li dijî jinê hat lidar xistin, bûn û bi hev re daxuyaniya çapemeniyê dan (Arıcı & Anonim 2015: 75). Lewre berdevka ne fermî ya platformê Nurcan Ay Katırcı, ku herweha di Eğitim-Senê de aktîf e, „buyera Özgecan“ (*Özgecan olayı*) wek xala derketinê ya tevgerên jinan ên Artvînê dest nîşan dîke (Ay Katırcı 2015: 4).

⁴⁹ „Biz bir arada olduğumuz zaman bizi dikkate alıyorlar. Ama tekil bireyler olduğunuz zaman, bazen seviyorlar, bazen sevmiyorlar ama bir platformu sevmeme şansları yok.“

⁵⁰ „[...] dedik ki [...] ,herkesi arayalım, tüm dernekleri, [...] tüm sendikaları, STK'ları; ,ortak bir şey yapalım' diye konuşuldu.“

Ji sendikaya perwerdeyê Eğitim-İşê Filiz Karakuş xwe wek endama damezirandina platformê pênase dike û balê dikişîne ser navdariya wê: „Hemû jinên li Artvînê [...] dizanin [li vir] platformekê heye.“ (Karakuş 2015: 61)⁵¹ Hemî gel – herweha mêr – ji bo tevîbûna platformê hatine vexwendin (Karakuş 2015: 59).⁵² Ligel mijarên derbarê şîdeta li hember jinê, li gorî dîtina Karakuş, divê astengî, malbat û derdor ⁵³ jî di nav platformê de bî dest girtin: „Ango ger pirsgirekeke civakî hebe, divê ev tim li ber çav bê girtin.“ (Karakuş 2015: 49, 55, 81)⁵⁴ Karakuş di hevpeyvînê de têşeyên çalakîyê yê platformê, wek mînak rêxistinîkirina kampanyayên imzayê û panelan, rexne dike û van çalakîyan wek têşeya ragihandina yekalî ya dewletê dinirxîne. Ew pêşniyar dike û dibêje, divê platform biçe serdana niştecihên jinên bajêr, jinên li gundan dijîn ziyaret bike û piştgiriya bide wan (Karakuş 2015: 21-23). Herweha Ay Katırcı mobîlîze kirina jinên bajêr, ku nikarin xwe îfade bikin û dengên xwe nikarin bilind bikin, wek armanca platformê dest nîşan dike. Li gorî Ay Katırcı divê platform bibe dengê hemî jinan (Ay Katırcı 2015: 12).⁵⁵

Ji ber ciheregiya aktor*ên di nav platformê de cihê xwe digirin, heta neha xeteke zelal nehatiye pêş xistin (Ay Katırcı 2015: 12). Sendîkavana çepgirt Ay Katırcı di hevpeyvîna xwe de nêrînên platformê wergerandina komeleyekê ku tê de beyî nasnameyekê bilind, jinên bi fikrên cuda cihê xwe karibin bigirin, tîne zimên. (Ay Katırcı 2015: 12) Bi vî awayî derveyî buroya sendîkaya Eğitim-Senê „ciheke nêtir“ (*nötr bir yer*) wek cihê civînê dikare bê dîtin (Arıcı & Anonîm 2015: 81). Herweha li gorî Özge Zeynep Arıcı divê perspektîfên cuda yê di navbera platformê li aliyekê bîne hiştin û ji dêl vê de ‚Jin-bûn‘ wek xaleke bi hev ve girêdanê li navendê bisekine (Arıcı & Anonîm 2015: 75).

Femînîsteke akademîst ji Zanîngeha Artvîn Çoruhê bikaranîna têgehên femînîst ên di nav platformê rexne dike. Wek mînak ji dêl ‚jin‘ê (kadın) bikaranîna pêyva ‚xanim‘ (*hanım*) di nav

⁵¹ „Artvin'deki tüm kadınlar [...] bir platform olduğunu biliyorlar.“

⁵² Tevîbûna mêran di nav hevkar*ên koalîsyonê de hin jî mijarê nîqaşê ye (Arıcı & Anonîm 2015: 55-57).

⁵³ Têkiliya nêz a aktîvîstan bi tevgera ekolojîyê xwe bi endambûna Komeleya Keskan a hin hevpeyvîneran de nîşan dide.

⁵⁴ „Yani eğer toplumsal bir problem varsa bu hep göz önünde olacak.“

⁵⁵ Bi çî awayî ev daxwaz bi çalakîyên rastî an jî bi têkiliya aktîv ên koma hedefgirtî bi dest dikeve, di çarçoveya vê lêkolînê de nikaribû bê tespît kirin.

hevkarên platformê de kemasiya hişmendiya femînîst dide der (Arıcı & Anonîm 2015: 57).⁵⁶

Pirsgirêka herî mezin a platformê li gorî Arıcı, – bi hinceta jinên Artvînê şîdetê nabînin û ji ber vê sedemê têkildar nabin – motîvasyona kêma jinan ji bo beşdarbûna siyaseta jin û zayendî ye (Arıcı & Anonim 2015: 77, 84). Ji ber vê rastiyê di platformê de bi giranî jinên mamoste, akademîsyen û xwendekarên ku ne ji Artvînê ne cihê xwe digirin, û bi vî awayî alikariya jinên heremî kêma dimîne, herweha ji bo pêşerojê stabîlîteya platformê wek lawaz dinirxîne (Arıcı & Anonîm 2015: 79). Endamên CHP Sevda Ersöz û Arzu Sevim herweha ya MHP Pervîn Aslan heman xetereyê dibînin. Ew jî platformê wek ji „derhanî“ şîrove dikin û ji bo qada lêkolînê Artvînê di cîh de nabînin (Sevda Ersöz û yên din 2015: 91).

Platforma Jinan a Hopayê (Hopa Kadın Platformu)

Platforma Jinan a Hopayê ji aktîvîstên sendikayên çepgirt, wek Eğitim Sen û DİSKê, herweha ji partiyên wek ÖDP, CHP û ji Meclîsa Jinên Çepgirt SKM pêk tê. Platform ji hêla jinên Malên Gel ve hat bi rêxistin kirin. 2014'an de yekemîn çalakiya derbarê 25'ê Mijdarê li Hopayê hat li dar xistin.⁵⁷

Her çiqas ev platform di dema lêkolînê de êdî ne aktîf bû jî li gorî Arduç û jinên ji Malên Gel, di 8'ê Adarê û 25'ê Mijdarê de di mijarên wek şîdet, ‚fihuş‘, kedxwarî, nijadperestî, şer an jî ekolojiyê de çalakî tîn li dar xistin (Arduç û yên din. 2015: 40-43, 47-49). Malpera platformê di sala 2015'an de hin jî aktîf bû. Nurcan Vayiç Aksuya ji Partiya Sosyalîst a Bîndestan ESP malpera platformê bi zanebûn ne girtiye, lewre bi riya malperê hin jî dikarin xwe bigihînin jinên serbixwe, ku di nav platformê de cihê xwe digirin. Herweha bi vî awayî dikare xuyakirina jinên çepgirt an jî tevgerên jinan ên çepgirt bê pêk anîn (Vayiç Aksu 2015: 5, 7). Li gorî çepgirt Vayiç Aksu divê rêxistinên jinan ên partiyên siyasî serbixwe bixebitîn lê di nava platformê de divê xeta tekoşînê ya hevpar bişopînin (Vayiç Aksu 2015: 7). Ji bo vê divê pêdivî bi rêxistinbuyîna jinan heye, wek mînak rêxistinekê ku karibe bi kebanîyên malê yên bajarê piçûk

⁵⁶ Di zimanê Tirkî de pêyya ‚keçik/keç‘ (kız) di wateya keçbûnê de an jî azebûnê de tê bikaranîn, bi pêyya ‚jin‘ê (kadın) jina zewicandî û di hêla cinsî de aktîf tê fêhm kirin. Ji ber fêmkirina ‚cinsî‘ ya pêyya ‚jin‘ê aliyên oldar-muhafezekar û Kemalîst peyya ‚pîrek‘ (bayan; hanım) wek xîtab an jî pênase bi kar tînin. Femînîst di bikaranîna peyya ‚jin‘ê de li hev dikin û bi vî awayî balê dikişînin ser zayendiya jinên nezewicandî.

⁵⁷ <http://www.etha.com.tr/Haber/2014/11/25/kadin/hopada-ilk-25-kasim-eylemi/>.

re bibe bersîv (Vayıç Aksu 2015: 11).

1.5 Encam: Berhevdana koalîsyonên jinan li her çar heremên lêkolînê

Li qadên lêkolînê di dema lêkolînê de (2014-2016) tevîhev 12 koalîsyonên jinan ên cihî û heremî hatin tespît kirin. Ev koalîsyon tevgerên gelek heterojen, komên hedefkirî û herweha komên hedefkirî wêdetir kes an jî koman di nava xwe de dihewînin.

Dema li Enqerê li gorî krîterên di destpêka vê nivîsê de hatin rêze kirin, sê koalîsyonên jinan hatin tespît kirin, li bajarê mezin Diyarbekirê tenê Kongreya Jinên Azad KJA hat diyar kirin. Li heremên lêkolînê li Denizli û Trabzonê, ku hejmara niştecihên wan li seriya sedhezaran e, li herdû bajaran du koalîsyonên jinan ên cihî hatin nas kirin. Li bajarên piçûk, Muğlayê ya li Herema Egeyê û Artvînê ya li Herema Deryaya Reş di dema lêkolînê de tenê koalîsyoneke jinan, ku ji hêla hin aktor*an ve wek platforma piştgiriya bi jinan hat bi nav kirin, hat tespît kirin. Herweha Hevcivîna Jinên Egeyê wek koalîsyoneke cihî hat vegotin û behsa hewldanên avakirina koalîsyoneke jinan a cihî li bajarê piçûk Hopayê hat kirin.

Xwebinavkirinên wek „platform“ (*platform*), „kolektîf“ (*kolektif*), „koalîsyon“ (*koalisyon*), „kongre“ (*kongre*) û „hevciwîn“ (*buluşma*) ji bo analîz kirina têgihîştinê û stabiliteya koalîsyonan agahiyên destpêkê didin.

Endam û beşdariyên koalîsyonan – li gorî her koalîsyonê bi rêjeyên cuda – ji aktîvîstên rêxistinên jinan, ji jinên rêxistinên têkel zayendî û herweha ji aktor*ên serbixwe pêk tên. Berhevdana endaman ya li herêman nîşan dide ku li qadên lêkolînê yê Muğla û Artvînê rêxistinên siyaseta jin û zayendî dikin, ji sînorên siyasî-bîrdozî wêdetir dikarin – ji yê bajarên mezin Enqere, Diyarbekir, Trabzon û Denizliyê zedetî bi hev re bixebitin, lê yê bajarên mezin Enqere, Diyarbekir, Trabzon û Denizliyê. Ligel cudahiya birdozî û polîtîk hevkarîya nêz a endamên koalîsyonan dikare bi kêm hejmariya aktor*ên siyasî yê polîtîk bê rave kirin. Lahn, girêdayî çarçoveya lêkolînê ya Almanayê behsa „meyla tevgerên perîferiyê ji bo hevkarî û entegrasyonê“ dike (Lahn 2007: 54). Destpêkê bi riya avakirina koalîsyonan dikarin aktor*ên siyasî yê jin û zayendî balê bikişînin ser mijar û daxwazên xwe yê li bajêr. Û ev yek ji hêla aktîvîst*an, ku di vê nivîsê de beşên ji hevpeyvînan wan cihê xwe digirin, tê zanîn.

Bi demê re, girêdayî guhertinên siyasî yên hundirîn pêkhatiya koalîsyonê jî diguhire, hesasbûna wan xuyatir dibe. Wekî mînak, dema li Muğlayê di nivê salên 2000'an de aktor*ên oldar-muhafezekar jî di nav Platforma Piştigiriya bi Jinê de cihê xwe digirtin, di dema lêkolînê de ev aktor* êdî beşdarên platformên ku hatin tespît kirin, nedibûn. Ev dîtina azmûnî zêdetir ji hev dûrketina aktîvîst*ên oldar-muhafezekar û tevgerên jin ên din dide der.⁵⁸ Ji ber vê yekê çarçoveya li vir tê pêşkêş kirin, nikare wek çarçoveya koalîsyonên hemî jinan* ên li Tirkiyê bê şîrove kirin.

Pirsa hevkarên koalîsyonê yên guncav, wek mînak hevkarîya bi meran re, bi tevgerên muxalîf an jî bi tevgera LGBTI re di nav koalîsyonên ku liv ir hatin dest girtin de mijarên nîqaşê ne. Herweha hevkarîya bi dewletê an jî rêveberiyên heremî re di navbera hin koalîsyonan de sedema ji hev cuda bûnê ye. Wek mînak Platforma Jinan a Trabzonê bi saziyên dewletê re dişuxule, li aliye din ev hevkarî ji hêla çepgirt Platforma Piştigiriya bi Jinan a Trabzonê ve tê red kirin. Xalên tevgerên jinan ji hev cuda dikin, ku di nivîsa III.3.A. de hatin dest girtin, di analîza koalîsyonan de jî dikarin bînin dîtin. Bi taybetî wateya bîrdoziya femînîst û pratîkên femînîst, wekî mînak di navbera endaman de danûstendina bê hîyerarşî di nav koalîsyonan de roleke cuda dilîze. Dema wek mînak di koalîsyonên jinan ên li Denizli û Trabzonê yên netewperest an jî kemalîst de saziya berdevkiyê heye, ev siyaseta cigir*a navxweyî ji hêla aktîvîstên Kolektîfa Femînîst a Enqerê tê rêxne kirin. Aktorên femînîst girêdayî têgihîştina xwe ya xweser û girêdayî takekesî daxwaza koalîsyonên serbixwe, ango bê mîr û bê rêxistinên têkel zayendî, wek mînak partî an jî sendîka, dikin.

Wek sedemên damezirandina koalîsyonan dikarin mijarên transnasyonal ên wek 8'ê Adarê, an jî bi giştî tekoşîna Jinan a li hember siyaseta jin û zayendî ya hikumeta AKP, bi taybetî qanûna kurtajê û beşdarbûna siyasî ya jinan, lê berî her tiştî mijara şîdeta li ser jinan dikarin bînin bi nav kirin. Wek mînak Platforma (Piştigiriya bi) Jinê ya Artvînê di sala 2015'an de bi mebesta kuştina Özgücan Aslan wek bertek hat damezirandin. Armancên koalîsyonan wek avakirina toran, di

⁵⁸ Ji bo analîza xala ji hev cuda „ol/muhafezekarî“ ya di navbera tevgerên jinan li nivîsa III.3.A. binêrin. Hevkarîya navbera tevgerên jinan û aktîvîstên Tevgera Jinên Kurd di çarçoveya vê nivîsê de herweha di nivîsên III.2.B. û III.3.A. de hatin dest girtin.

navbera aktor*ên bi bîrdozî û siyasetên cuda de piştgiriya ava kirin, bi hev re li heremên lêkolînê daxwazên siyaseta jin û zayendî pêş xistin. Li her çar heremên lêkolînê ciheregiya mijarên koalîsyonan dikaribûn bîn tespît kirin, ligel vê bi taybetî li Muğla û Artvînê mijarên ekolojîyê ji hêla koalîsyonên li wir ve tîndîst girtin. Bi giranî di nav koalîsyonan de medyaya dijîtal wek amûrê ragihandinê tê bi kar anîn û bi vî awayî aktîvîte tîndîst girtin.

Dîroka damezirandina koalîsyonan nîşan dide ku di avakirina koalîsyonên li Enqerê û Muğlayê herweha di avakirina Platforma Piştgiriya bi Jinê ya Denizliyê de bi taybetî aktorên femînîst bandora xwe lê xistine. Bi pêvajoyê re hin aktorên femînîst xwe ji koalîsyonan paş de kişandine, wek mînak ji Hevciyîna jinên Egeyê, ku di dema lêkolînê de giranî bi aktor*ên ji partiyên siyasî an gî rêxistinên dihat birêve birin. Ev dîtîna azmûnî di heman demê de guherbariya endamên koalîsyonê dest nîşan dide.

Li Enqerê û Diyarbekirê ji bo koalîsyonên heyî, wek mînak Kolektîfa Femînîst Enqere an jî Kongreya Jinên Azad, kevneşopîya wan a ji salên 1990'î an jî 2000'î vir de hatin ber çav girtin. Damezirandina Koalîsyona Piştgiriya bi Jinê ya Muğlayê di sala 2004'an de nîşan dide ku, li hin heremên deştî yê Tirkiyê de hin berê de koalîsyonên jinan ava bûne. Ligel vê li Herema Deryaya Reş koalîsyon hin di dawîya sala 2000'an li Trabzonê, di nivê 2010'an jî li bajarê Artvînê ji hêla aktor*ên çepgirt ve hatine ava kirin. Koalîsyonên li bakurrojavayê Tirkiyê hatine ava kirin, ji hêla pispor*ên siyaseta jin û zayendî ve wek instabîl/nerûniştî hatin nirxandin. Ji bo stabîlîteya koalîsyonê avasaziya rêxistinê wek xaleke giring dikare bê dest girtin. Wek mînak Kongreya Jinên Azad KJA, ku tîşeya rêxistinbûna xwe di dawîya nîqaşên salekê de pêş xist, dikare wek rêxistineke gelek rûniştî bê nirxandin.

Hebûna koalîsyonên jinan li heremên lêkolînê yê Tirkiyê tenê bi serê xwe nîşan dide ku her çiqas kategoriya zayendê di çarçoveya rexneyên (post)strukturalîst, postkolonyal û queer femînîst di nîqaşên aktîvîstan û akademîsyenan de ji navendê û ji hev hatibe derxistin jî –di hin rewşan de – hin jî ji bo tevgerên civakî yê li Tirkiyê wek xala krîstalîzasyonê dikare bê nirxandin.

Çavkanî

- Acar, Feride; Altunok, Gülbanu (2009): Paths, Borders and Bridges. Impact of Ethnicity and Religion on Women's Movement in Turkey. Navnîşana Online http://www.quing.eu/files/WHY/acar_altunok.pdf, nihêrtina herî dawî 11.08.2014.
- Al-Rebholz, Anıl (2013): Das Ringen um die Zivilgesellschaft in der Türkei. Intellektuelle Diskurse, oppositionelle Gruppen und Soziale Bewegungen seit 1980. Bielefeld: transcript.
- Binder, Charlotte (2016): Der Internationale Frauentag nach der Dekonstruktion von Geschlecht. Eine empirisch-qualitative Vergleichsstudie zu Bündnispolitiken im Rahmen des 8. März in Berlin und in Istanbul. Dissertationsschrift. Universität Bremen, Bremen.
- Hildebrandt, Cornelia (2007): Bündnispolitik. Di nav: Ulrich Brand, Bettina Lösch und Stefan Thimmel (Ed.): ABC der Alternativen. Von „Ästhetik des Widerstands“ bis „Ziviler Ungehorsam“. Hamburg: VSA, p. 36–37.
- Kılıçoğlu, Özlem (2004): Muğla’da kadın örgütlenmeleri. Lisans Tezi. Muğla Üniversitesi, Muğla.
- Lahn, Ulrike (2007): Flog die Tomate auch in der Provinz? Die Anfänge der Zweiten Frauenbewegung in der Provinz und ihre Bewegungsstrategien. In: Ariadne. Forum für Frauen- und Geschlechtergeschichte (51), p. 54–59.
- Leidinger, Christiane (2011): Kontroverse Koalitionen im politischen Laboratorium Camp. antimilitaristisch-feministische Bündnisse und Bündnisarbeit als kontingente, soziale Prozesse. Di nav: Österreichische Zeitschrift für Politikwissenschaft 40 (3), p. 283–300.
- Levi, Margaret; Murphy, Gillian H. (2006): Coalitions of Contention. The Case of the WTO Protests in Seattle. Di nav: Political Studies 54 (4), p. 651–670.
- Raschke, Joachim (Hg.) (1985): Soziale Bewegungen. Ein historisch-systematischer Grundriss. Frankfurt/M.: Campus.